# **Dr.Michiel Leezenberg** "Mafê ziman li gorî medenîbûn û nemedînîbûnê naguhere, ev mafekî fitratî ye."

HEVPEYVÎN: Kenanê Nado/Mûradê Gundikî

***Dr.Michiel Leezenberg li zanîngeha Amsterdamê dixebite. Karê wî bi awayê fermî felsefa zanînê ye, yanî "philosophy of since" e. Lê ew gelekî li ser dîroka aqlî ya alema Îslamê xebitiye. Beriya bîst salan li Hewlêrê di zanîngeha Selahaddîn de jî cih girtiye.***

***Bi munasebata 114. salvegera Rojnamegeriya Kurdî li festîvala Soranê me û birêz Dr. Leezenberg bi hev re suhbeteke kurt kir. Ev kelam û gotinên han ji bo we pênGAVhezan e.***



**pênGAV:** Te çawa zimanê kurdî nas kir û biryar da ku tu zimanê kurdî fêr bibî û li ser bixebitî?

**Dr.Michiel Leezenberg:** Di sala 1988an de cara yekem bû ku ez  li Kurdistasnê bûm. Wê demê min

fîlolojiya klasîk yanî Latînî û Yûnanî dixwend. Lê min derbarê siyaseta nûjen de tu tiştî nizanîbû. Wê wextê min çend Kurd li bakurê Kurdistanê nas kirin û çend kesên welatparêz ên Tirk li Diyarbekirê. Mesela wan nijadperestên Tirk digot: "Kurd tune ne, ew hemû Tirk in. Lê te dît ew çend xayîn hene ku dibêjin, na ew ne Tirk in ew Kurd in."

Kurd wê wextê ji axaftina bi zimanê xwe ditirsiyan. Wan nedikarî bi serbestî bêjin em Kurd in û zimanê xwe biaxivin. Piştre ez çûme rojavayê Kurdistanê, şehrê Helebê, li wir jî eynî tişt hebû. Ji ber wê min xwest ku ez rewşa Kurdan û rewşa zimanê wan bizanim. Min bi hînbûna kurdî dest pê kir, kitêba Celadet Bedirxan û Roger Lescot xwend û her wiha çend kitêbên din ên li ser zimanê Kurdî. Salek paşê careke din ez çûme Tirkiyê, Sûriyeyê û Iraqê da ku ez rewşa Kurdan bizanim.

**pênGAV:** Te got xebatên min ên li ser Kurdan hene. Ev çi xebat in?

**Dr.Michiel Leezenberg:** Bi rastî di salên 90î de min dixwest lêkolînê bêhtir li ser ziman bikim. Mesela min li başûrê Kurdistanê li ser lehçeyên hewramî jî lêkolînê kirin. Di eynî wextê de ji ber ku rewşa siyasî gelek xerab bû, divê min li ser rewşa siyasî, aborî û civakî jî binivîsiya. Ji ber wê di salên 90î de min li ser aboriya siyasî û avakirina herêmên Kurdistanê



jî nivîsiye. Di sala 92yan de jî li ser herêma Kurdistanê raporekê nivîsiye.

**pênGAV:** Dibêjin ku tu zaravayên Kurdî hemû dizanî, tiştekî wisa heye?

**Dr.Michiel Leezenberg:** Bi rastî ez bi taybetî zaravayê Kurmancî hîn bûm. Paşê hinek jî soranî hîn bûm, lê min dixwest Kirmanckî û Hewramî jî hîn bibim. Lê wê wextê karê min bi resmî ne li ser Kurdan bû, ji bo doktorayê divê min tiştên din bixwendana. Min hin lêkolîn kirin, lê min nikarîbû ku ez dom bikim. Min gotarek li ser lehçeyên zimanê Kurdî nivîsiye. Lê heya îro nahatiye çapkirin, ji ber ku min di konferansekê de pêşkeş kir, gotin evê wek kitêb bê çapkirin, lêbelê ev 19 sal e hê jî çap dibe…

**pênGAV:** Li bakurê Kurdistanê jî hin livîn û tevger çê dibin bi taybetî derbarê ziman de hûn vêya çawa dibînin?

**Dr.Michiel Leezenberg:** Ya rastî bawerîneanîneke Kurdan heye li hember helwesta Tirkan. Mesela rewş du sal berê çêtir bû ji îro. Lê dîsa jî em dibînin ku li hin zanîngehan beşên Kurdî vedibin, ev jî ne bes e ya muhîm ew e ku divê ev ji dibistanên seretayî ve bên dest pê kirin.

Ya muhîm ew e ku meriv divê ji hukumeta Tirk re bêje ku perwerdehiya duzimanî tişteke normal e û halê we yê heyî, ji nêrîna şovenîst ya Kemalîzmê tê. Li Fransayê jî bi heman rewşê ye, zimanê perwerdehiyê û resmî tenê zimanê Fransî ye. Ne lehçeyê Oksîtan ne lehçeyê Basklan heye. Li Tirkiyê jî ev fikra monolojiyê heye. Li gelek welatan, mesela li Îsviçre, Hindistan, Kanada, Afrîkaya Başûr pirzimanî heye û bo yekbûna neteweyî ne problem e.

Divê meriv ji hukumeta Tirk re bibêje ku axaftin û perwerdebûna zimanê zikmakî mafekî mirov e. Mesela çend meh berê cîgirê serokwezîrê Tirkiyê Bulent Arinç dibêje belê merivê destûrê bide lê heger medenî be. Ev mafê han li gorî medenîbûn û nemedînîbûnê naguhere. Ev mafekî fitratî ye. Ev heqê wî an jî wê mirovê ye.

**pênGAV:** Ji bilî ziman we got ku ez bi taybetî li ser dîroka dînên li rojhelat jî xebitîme. Tu yê faktora dîn ji bo Kurdan çawa binirxînî?

**Dr.Michiel Leezenberg:** Heger em bêjin welatparêzî û avakirina nasnameya netewî ya Kurdan tiştekî nûjen û laîk e ev ji objektiviyê dûr e. Bi giştî welatparêzî tiştekî modern û laîk e. Lê li nav Kurdan avakirina nasnameya neteweyî bi taybetî li medreseyan hatiye avakirin. Kitêba Elî Teremaxî, Mela Yûnisê Helqetînî, Melayê Cizîrî, Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi taybetî kitêbên ku bo zarokan amade kiriye mîna Nûbihara Biçûkan û Eqîda Îmanê ku zimanê van berheman jî

Kurdî bûne. Ji ber vê ye ku di avakirina nasnameya netewî ya Kurdan de alîkariyeke mezin kirine. Yanî avakirina nasnameya netewî tenê ne tiştekî laîk e, ji bo wê dîn ji bo Kurdan gelek girîng e. Her çi qas di van medreseyan de piranî Kurdê sunnî û şafiî bin jî Kurdên êzîdî, Ehlê Heq û Elewî jî hene.

**pênGAV:** Di Kurdên Yarisan û Ehlê Heq de tasavvuf û muzîk bi xwe re çanda Kurdan jî qedîm kirine, yanî tesîreke erênî heye. Rast e?

**Dr.Michiel Leezenberg:** Dr. Falkhledîn Kakeyî jî dibêje êzîdê û yarisanî yanî ehlê heq ji wextê Zerdeşt in. Dînê Zerdûşt yanî dînê Mazdeî dînê eslî yên Kurdan bû. Lê belê piştî ew bûn misilman dînê wan jî bi giştî guherî li ser Îslamê. Yanî tu niha dikarî bibêjî ku Yarisanî, Êzidiyatî û piçek jî Elewîtî ji dînê Zerdûştî tên. Dîn tiştekî girîng e, berî bîst salan Kurdistan bêhtir laîk bû, lê aniha dîn wekî axaftineke siyasî tê bi kar anîn. Mesela berî bîst salî di axaftina siyasî de fikrên marksîzmê gelek navdar bû, bi taybetî Kurdên welatparêz şoreşê bi vê fikrê dikirin. Lê niha ew kêm maye û hêdî hêdî ji nav axaftina siyasî ya giştî derdikeve.

**pênGAV:** Ev her sê dînên qedîm(êzidîtî, yarisanî, misilmanî) jî li gorî min ferqeke mezin di navbera wan de nîne. Di kok û bingeha hemûyan de heqîqet û edalet radizê. Tu çi dibêjî?

**Dr.Michiel Leezenberg:** Li gorî min êzîdî û ehlê heq jî ji yek terefî ji Sûfîtiyê hatine. Mesela berî heftsed salî Îbn-î Teymiyye li ser tasawûfa Îbn-î Arabî nivîsiye û wî digot ku şerîet divê ji hemû tiştî bilindtir be. Her wiha wî jî kitêbekê li ser Êzidiyan nivîsiye. Tiştekî pir girîng e ku wî ji êzidiyan re negot “ew şeytanperest in, ew kufr in û hwd” wî digot mîna hemû Kurdan êzîdê parêzê Şêx Adî bûn, wan Şêx Adî wek pêxember dipejirand. Wî wisa bawer dikir ku teyfa êzidiyan teyfeke sûfî ye, ne teyfeke misilman e. Lê ew nêrîna li ser Şêx Adî xelet hatiye fêmkirin.

**pênGAV:** Navê kitêba Îbn-î Teymiyye ya li ser êzidiyan çi bû?

**Dr. Michiel Leezenberg:** “Red- el ‘elel Edawî” bû bawer im, yanî nabêje êzidî, dibêje Edawî yanî Şêx Adî.

**pênGAV:** Gelek spas seyda, di gotina xwe ya dawî de ji bo pênGAVê hêviyên te çi ne?

**Dr.Michiel Leezenberg:** Tiştekî gelek xweşik û girîng e ku li bakurê Kurdistanê di zanîngehan de xebateke wiha heye, tiştekî biçûk lê girîng e û ez hêvî dikim ku di paşerojê de ev ê geştir bibe.

**pênGAV û Dr. Michiel Leezenberg:** Spas, zor spas, spas xweş, spas:)